Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1085 | 26-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Koma Sitiya Nexşa bi xebatên xwe çanda kevnar a Êzidiyan diparêze

**Koma Sitiya Nexşa ya jinên Êzidî ku navê xwe ji xwedawenda çand û hûnerê Sitiya Nexşa digre bi xebatên xwe yê hûnerî çanda civaka Êzidî diparêze.**




Koma Sitiya Nexşa ku navê xwe ji xwedawenda çand û hûnerê Sitiya Nexşa digre, ev nêzî salek e ji bo parastina çand û hûnera jinên Êzîdxanê hatiye avakarin. Koma Sitiya Nexşa ya bi komên stran û dîlanê çanda civaka Êzidî diteyisîne û diparêze, klîbekê nû ya 5 dîlanên kevnar a Êzidiyan tê de cih digre weşand. Jinên ciwan ên Êzidî ku di klîbê de bi cil û bergên xwe yên gelerî cih girtin anîn ziman ku ew bi riya xebatên xwe çand û hûnera xwe diparêzin.

### Çanda xwe nîşan didin û diparêzin

Nîdal Qasî yek ji endamên Sitiya Nexşa ye ku di koma dîlanê de cihê xwe derbarê xebatên xwe yê di nava komê de wiha got: “Ev nêzî 3 salane ez di çandê de cih digrim. Armanca me ew e ku em dîlanên xwe ên kevnar û cil û bergên me yê Êzîdiya bên parastin û naskirin. Armanca me ya vê kilîpê ew e ku ciwanan derbarê çanda kevnar a Êzidiyan de hişyar bikin. Me bi rêya vê kilîpê cihên kevnar û cihên pîroz ên Şengalê pêşan da. Hestek gelek xweşe komek me ya xweser heye û me kilîpek derxist.  Ji bo pêşerojê jî pilanên me heye, em kilîpên nû bi dilîanên me yên kevnar û cur be cur çêbikin. Gelek ciwanên me hene dîlanên me ên kevnar nizanin. Bi rêya van kilîpan em wan jî agahdar dikin. Armanca me ya bingehîn parastina çanda Êzîdayetiyê ye.”

### ‘Armanca kilibê ew e ku hemû kes li çanda xwe vegere’

Xezal Xêro ya endama dîlanê ya koma Sitya Nexşa  hestên xwe wiha anî ziman: “Ji 8’ê Adara îsal ve em li ser vê kilîpê kar dikin. Me 10 rojan pirove kir û piştî wê me dest bi kişandina klîbê kir. Ev klîp ji bo me gavekî mezin bû ji ber ku em weke komek jinên ciwan li hev kom bûn û di bin sîwana Sitiya nexşa de me kilîbek a govendê çêkir. Heta niha komên wiha di nava Şengalê de nebûn û bi rêya Sitiya Nexşa me pêş xist.”

Xezay Xêro bal kişand cilên gelerî yên di klîbê de hatiye li xwekirin û wiha got: “Cil û berg, govend hemû çanda Êzîdiyane. Me li cihên cûda yên Şengalê û bi taybet li cihên ku pîrozin me kilîpa xwe kişand ji bo ku her kes çanda Êzîdiyan bibîne. Berê niha tiştên wisa nebûn. Lê bi rêya şano û kilîban em dixwazin çanda xwe bidin nasandin. Ji ber çanda me ya kevnar gelek nedihat naskirin. Stranên kevin piraniya nifişê nû guhdar nakin. Di heman demê de dîlanên kevin nemane, yên ku mane jî fugurên wan hatine guhertin. Armanca me ji vê kilîbê ew e ku hemû kes li çanda xwe vegere.”

### Xwedawenda çand û hûnerê: Sitiya Nexşa

Xezal Xêro bal kişand li ser navê komê ya Stiya Nexşa ku weke xwedawenda parastina çand û hûnerê di nav civaka Êzidî de tê nasîn û wiha got: “Beriya sedan sal jinekî bi navê Sitiya Nexşa hebû. Stran digot û nexiş çêdikir. Wê nexşên bi ta li ser paçan çêdikir di heman demê de li sazê dida û stran digot. Li piştî wê jinekî ku stran digot nebû. Piştî fermanê em jî her tiştî dikin da ku em hemû keda jin diyar bikin. Jina di dîrokê de çi bû wê niha jî wisa be. Bi taybet di dîroka Êzîdiyan de rolê jinê sereke bû.”

### ‘Parastina herî mezin naskirina çanda xwe ye’

Xezal Xêro ya bang li Êzidiyan kir, wiha got: “Xelkê me yê Êzîdî ku welat ber didin û koçber dibin em ji wan re dibêjin rêya xwe parastinê ne reva ji welat e. Parastina herî mezin tu çanda xwe jiyan bikî û biparêzî. Bi koçberiyê çand û ziman winda dibin.”
Xezal Xêro di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku jinên Êzidî piştî naskirina fikr û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di her warê de bihêz bûne û got: “Piştî ku fikrê Rêber Apo kete Şengalê, Şengal gelek pêş ket. Beriya ku fikrê Rêber Apo were Şengal me tiştek wisa ne dizanî û ne difikrî. Piştî fikrên wî herkesî li ser baweriya me lêkolîn kir. Lewra weke koma Sitiya Nexşa çi erk dikeve ser milê me emê bikin.”

# Germahiya global a ji ber mirovan zêde dibe

**Li gorî lêkolîneke navneteweyî, germbûna ji ber fealiyetên mirovan di deh salan de bi rêjeya ji 0,2 °C zêdetir bûye.**



Lêkolîn di kovara Earth System Science Data de hat weşandin. Di lêkolîna ku nêzî 50 zanyar tê de cih girtin de hate destnîşankirin ku emîsyona gaza serayê di asteke bilind de ye. Lêkolîneran wiha nivîsand, “Di 2013-2022’yan de, germahiya ku ji ber fealiyetên mirovan pêk hatî di her deh salê de ji 0,2 °C re derkete astek ku mînaka wê nîne.”Lêkolîn li ser rêbazên Panela Navdewletî ya Guherîna Avhewayê (IPCC) hat kirin. Li gorî kovarê, komek lêkolîner a navneteweyî sentezek nû ji cûrbecûr çavkaniyan afirandiye da ku nîşanên sereke yên rewşa pergala meya avhewa bi rengekî azad, gelemperî û zelal ragihîne.
Bi nirxandina emîsyonê, giranî, germahî, veguheztina enerjiyê, hevsengiyên radyasyonê, û fealiyetên mirovî (di nav her rewşê de bi baldarî hesabkirina nediyariyan), lêkolîner gihîştin encamên jêrîn: Konsantrasyona gaza serayê ya li atmosfera me ya gerdûnî her ku diçe zêde dibe. Emîsyonên van gazên serayê, bi giranî ji ber bikaranîna sotemeniya fosîl û çalakiyên pîşesazî, her ku diçe zêde dibe, lê dibe ku nîşana wê yekê jî be ku rêjeya zêdebûna wan kêm bûye.
Germahiya gerdûnî û parzemînan her ku diçe zêde dibe. Nehevsengiya enerjiyê ya cîhanê her ku diçe zêde dibe. Bandora mirovan li ser hemû guhertinan serdest e.

Sudoku: Bersiv 94

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 1 | 2 | 8 | 7 | 3 | 6 | 4 | 9 |
| 9 | 4 | 8 | 1 | 5 | 6 | 2 | 7 | 3 |
| 7 | 3 | 6 | 4 | 2 | 9 | 8 | 5 | 1 |
| 2 | 6 | 3 | 5 | 8 | 4 | 1 | 9 | 7 |
| 4 | 8 | 5 | 9 | 1 | 7 | 3 | 6 | 2 |
| 1 | 9 | 7 | 3 | 6 | 2 | 5 | 8 | 4 |
| 3 | 5 | 9 | 6 | 4 | 1 | 7 | 2 | 8 |
| 6 | 2 | 4 | 7 | 3 | 8 | 9 | 1 | 5 |
| 8 | 7 | 1 | 2 | 9 | 5 | 4 | 3 | 6 |

Sudoku:Pirs 95

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 3 | 7 | 5 | | | | | |
| 8 | | | 2 | | | 4 | | 6 |
| | | 4 | 3 | | | 7 | 8 | |
| | 7 | | | | 9 | | | |
| 3 | | 8 | | | | 1 | | 4 |
| | | | 8 | | | | 7 | |
| | 8 | 1 | | | 4 | 2 | | |
| 7 | | 2 | | | 5 | | | 1 |
| | | | | | 7 | 6 | 5 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

### Çend taybetiyên biwêjan

- Biwêj jî weke gotinên pêşiyan, ji ber ku bûne qalib, bi giranî mirov nikare peyvên di wan de derbas dibin biguherîne û li şûna wan -di heman wateyê de bin jî- peyvên din dayne û mirov nikare di rêzkirina peyvan de jî ti guhertinan çêke.
- Biwêj jî weke gotinên pêşiyan, ji bo ku mijar bi kurt û cewher bê diyarkirin amûr in.
- Armanca biwêjan ew e ku têgînekê, yan mijarekê bi awayekî balkêş ragihînin.
- Di biwêjan de her çiqas mirov nikare di rêzikirina peyvan de ti guhertinan çêke jî lê li gorî rewşa tê gotin, dibe ku li gorî kes û cînavan, di kişandinê de guhertin çêbe.
- Dibe ku biwêj di heman demê de, di herêmên cuda de, bi peyvên cuda bên gotin.
- Biwêjên di zimanekî de, dewalemendiya nirx û çanda wî gelê ku bi wî zimanî diaxive diyar dikin.
- Gelek biwêj bi wergerandina zimanekî din ji wateya xwe derdikevin û bêbandor dibin. Mînak: Dema yek karekî pir baş dike, dibêjin; Sîsik jê firandin. Ku ev biwêj peyv bi peyv bi zimenekî din bê wergerandin, wê ti wateya wê nemîne.

- Biwêj ji bo xwe ti sînoran nas nakin; ka çawa bûye û çawa dixwaze wisa hatine gotin. Ne şermê nas dikin, ne tirsê. Mînak: Qûn lê teng bûye. Ji bo kesê bêhnteng dibêjin. Ziha gur pê ve ye. Ji bo kesê şansê wî heyî tê gotin.

- Taybetiyeke din jî ew e ku hin biwêj nêzîkî gotinên pêşiyan in, dualî ne; mirov dikare hem bi rengê gotinên pêşiyan bi kar bîne, hem bi biwêjkî. Lê ji ber ku bi biwêjkî jî mirov dikare wan bi kar bîne, di vê pirtûkê de di nava biwêjan de cihê xwe girtine. Mînak: Agir agirê qoçan e. Yê dizane jixwe dizane, yê nizane jixwe baqa nîskan e.

Ferq û cudayiya di navbera biwêj û gotinên pêşiyan de
- Biwêj, qalibekî taybet e û ji bo diyarkirin û vegotina têgîn, yan jî mijarekê hatine afirandin; lê gotinên pêşiyan gotinên wisa ne ku rêzik û qaîdeyên giştî diyar dikin.
- Armanca gotinên pêşiyan ew e ku rê nîşan bidin, dersê bidin, şîretan bikin û ji bo ku ibret bê girtin rastiyan radigihînin. Lê armanca biwêjan ew e ku têgînekê, mijarekê bi awayekî balkêş diyar bikin û wisa bikin ku mijar bi awayekî hêsan bê fêmkirin.
- Hin gotin dikevin nava danasîna her duyan jî. Ango hem ji gotinên pêşiyan in, hem ji biwêjan.
- Biwêj, bi giranî mecaz in, ne li ser wateya xwe ya rast in, lê gotinên pêşiyan dibe ku mecaz bin, dibe ku ne mecaz bin jî.



## Hevgirtin û yekrêziya Kurdan wê peymana  Lozanê hilweşîne

Sedsal li ser peymana Lozanê ku di encamê deKurdistanê hat perçekirin derbas dibe, dagirkerên xaka Kurdistanê hewil didin ku Lozanê dûbare bikin û gelê kurd bi temamî qir bikin, cîgira hevseroka Kongreya Neteweyî a Kurdistanê Hêvî Mustefa da zanîn ku ji bo nedûbarkirina peymana Lozana yekîtiya kurdan pêwîste. **R-2**

## Komkujî nikarin vîna gelan bişkînin



7 sal di ser komkujiya taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo re derbas bûn,  lê hîn jî êşa komkujiyê di dilê malbatê qurbaniyan de ye û nehatiye jibîrkirin. Malbatên şehîdên komkujiya taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo dan zanîn ku têkoşîna gelên herêmê û berxwedanan zarokên Rojava, plan û armancên çeteyan vala derxistin.**R-6**

## Şoreşa 19’Tîrmehê şoreşa şehîdan e

Meclisa Malbatên Şehîdan, wefedara berdêlên Şoreşa 19’ê Tîrmehê ye, ku bi hemû jiyan û karîna xwe destekê dide malbatên şehîdan e. Girêdayî kar û xebatê Meclisa Mlbatên şehîdan Hesen got: Ku xwedîderketina li malbatên şehîdên şoreşê, erka me ye. **R-5**

Civakek nû tenê bi çandek nû gengaz e
Zekî Bedran R-5

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1085 | 26-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# Jİ BO PEYMANA LOZANÊ ŞOREŞA 19’Ê TÎRMEHÊ BERSİV BÛ



Hevseroka TEV-DEM’ê Rûken Ehmed di salvegera 11’an a Şoreşa 19’ê Tîrmehê de diyar kir ku civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê di nava şert û mercên herî zehmet de gavên mezin avêtin û karîbûn di çarçoveya sazî û dezgehan de xwe bi awayekî rêk û pêk birêxistin bikin. Rûken Ehmed da zanîn ku nirxên şoreşa 19’ê Tîrmehê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê sînordar nemaye û li tevahî Rojhilata Navîn û cîhanê bûye xwedî bandor. R-4



## Ji bilî îradeya kurdan ti peyman nayê qebûlkirin

Encamnameya Konferansa dîrokî ya 2 rojan hate eşkerekirin ku nûnerên Kurdan li bajarê Lozanê di salvegera 100’emîn a Peymana Lozanê de lidar xistin.**R-3**



## Sîyabend û Xecê

Rengê tîr di destanên evînê de trajedî ye.Ji xwe trajediya di evînan de hiştî ku ew destan bê mirin û mayînde bibin.Ev rastî bi heqîqeta civakê ya piştgiriyê,mihrîbanî û dilovaniya civakî, ji helê din ve xewjînên(xeyal û daxwazên kesan) kesan ve, ku nigihane û nikarîne bijîn û di hinava wan de maye, bi jînkirin û dilşewatiya bi ser evîndaran ve, ku civak bi wan bûye civak,ve girêdayî ye. **R-7**



# Hevgirtin û yekrêziya Kurdan wê peymana Lozanê hilweşîne

Sedsal li ser peymana Lozanê ku di encamê deKurdistanê hat perçekirin derbas dibe, dagirkerên xaka Kurdistanê hewil didin ku Lozanê dûbare bikin û gelê kurd bi temamî qir bikin, cîgira hevseroka Kongreya Neteweyî a Kurdistanê Hêvî Mustefa da zanîn ku ji bo nedûbarkirina peymana Lozana yekîtiya kurdan pêwîste.

**Navenda Nûçeyan/ Qamişlo**

Piştî têkçûna desthilatdariya Osmanî di dawiya şerê cîhanê yê yekemîn de, bi saya peymana “Sevr” a sala 1920`an ku tekezî bi mafê Kurdan ê diyarkirina çarenûsa xwe kir, gelê Kurd nêzî pêkanîna xewna xwe ya avakirina Kurdistanê bû.

Piştî têkçûna dewleta Osmanî di şerê cîhanê yê yekemîn de, dewleta Osmanî hate neçarkirin ku bi dewletên serketî re di 10`ê Tebaxa 1920`an de peymana Sevrê îmze bike.

Li gorî vê peymana ku li bajarê Sevr ê Frasnayê hate îmzekirin de, hevalbendan sînorên dewleta Osmanî teng kirin û tenên herêmên ku bi zimanê Tirkî diaxivin di bin serweriya wê de hiştin. Vê yekê û li gorî bendên 62, 64 ên beşê sêyemîn ê peymanê, rê da gelê Kurd ku çarenûsa xwe diyar bikin û Kurdistanê ava bikin.

Lê belê di destpêka sala 1920`an bi serkêşiya Mustafa Kemal Ataturk netewperestan pêşketinek di “şerê serxwebûnê” de bi dest xistin. Vê yekê Ataturk teşwîq kir ku peymana Sevrê û sozên ji bo Kurdan, bi dawî bike. Ataturk piştrast kir ku ew avakirina dewleta Kurdistanê red dike û ji bo îmhakirina nasnameya Kurdî û tunekirina wan di civaka Tirkî de dest bi siyasetên tirkkirinê li dijî Kurdan kir.

Piştî wê hêzên hevalbend “Brîtanya, Fransa, Îtalya, Japon, Romaniya, Bûlgarîstan, Pirtugal, Belçîka, Yogsilaviya” neçar man ji bendên peymana Sevrê paşve vekişin û bi peymana “Lozanê 1923” guhertin. Bi îmzekirina Lozanê re gelê Kurd ket bin serweriya Tirkiyê, Îranê û hêzên Brîtanya û Fransayê ku Irqa û Sûriyê mêtînger kiribûn. Gelek bendên peymana Lozanê



**Hêvî Mustefa**


hebûn, lê belê tu bendên girêdayî Kurdan nehatin bibîrxistin. Hin madeyên giştî ku tekeziyê bi parastina mafên hemû welatiyên Tirkiyê bêyî cudabûna netewî, çandî û nasnameya wan dike hatin danîn. Her wiha hat gotin mafên hemû welatiyan heye ku bi serbestî bi zimanê dayikê biaxivin. Lê belê piştre qonaxa înkarkirina nasnameya Kurdî û qirkirina çandî û fîzîkî ku heta roja me dewam dike, li dijî Kurdan dest pê kir.

Ev peyman wekî rewakirina dûrxistina Kurdan ji nexşeya siyasî û xeternaktirîn peymana ku Kurdistan parçe kiriye, tê hesibandin. Di wê der barê de, Rêber Abdullah Ocalan di parêznameya pêncemîn a bi navê Şaristaniya Demokratîk-Doza Kurdî de wiha nirxand: “Bi îmzekirina peymana Lozanê û ragihandina komarê re, qonaxeke nû dest pê dike. Bi îmzekirina peymaneke xeternak li dijî Kurdan, dixwazin nakokiyên domdar bi Brîtanyayê re yên girêdayî Mûsil û Kerkukê bi dawî bikin.”

Rêber Ocalan wiha nirxandina mijarê dewam dike: “Peymana Enqere ya bi Fransayê re tevî pêşkêşkirina tewîzan ji Mîsaqa Millî, bandorên xeternak bi xwe re neanî. Her wiha di serdema Fransayê de parçeyekî biçûk hişt.”

Tevî hemû zext, êrîş, komkujî û siyasetên qirkirinê yên li dijî Kurdan, lê gelê kurd dest ji têkoşîna azadiyê berneda û bi 10’an Şoreşa hatin lidarxistin.

Herî dawiyê li Rojavayê Kurdistanê di 19’ê Tîrmeha 2012’an de Şoreşek bi saya fikr û felsefeya Rêber Apo hat destpêkirin. Di encamê de ji bo fikrê jin û gelên bakur û rojhilatê Sûriyê re bû vejnek nû. Hêjayî gotinê ye ku Serhildana Rojhilatê Kurdistan û Îranê ya di 16`ê Îlûna 2022’ de bi pêşengtiya jinan çêbû, bingeha xwe ji hêz û têkoşîna Şoreşa 19’ê Tîrmehê digire. Jinên Kurdistan û Îranê bi rihê Jîna Emînî û diruşmeya Jin, Jiyan, Azadî serhildan li dijî desthildariya dewleta Îranî gur kirin. Şorea 19’ê Tîrmehê û serhildana Rojhilatê



Kurdistan û Îranê ku berî sedsaliya Lozanê şoreşên herî nûjen in. Ji bo ku Lozan careke din dubare nebe, dagirkerî û desthilatdarî li ser gelên kurd û gelê din çênebe, pêwîstiya van gelan bi hevgirtinê heye. Hevgirtineke ku bibe bersiv ji dubarekirina Peymana Lozanê re. Herwiha rê li ber siyasetên qirêj yên dewletên dagirker werin gurtin, di serî de jî dewleta Tirkî.

Têkildarê sedsaliya Peymana Lozanê, cîgira hevseroka Kongira Netewî ya Kurdistanê (KNK) Hêvî Mustefa ji rojnameya me re axivî.

**‚Hevgirtina gelan’ wê hişmendiya Lozanê ya ‘sedê salan hilweşîne**

Hêvî Mustefa diyar kir ku bi hevgirtina gelên herêmê wê Peymana Lozanê hilweşe û wiha axivî: “Em di salvegera 11’ ya Şoreşa 19’ê Tîrmehê de ne, ku destpêkê ev şoreş li ser asta Rojava bû, herwiha bi felsefeya Rêber Apo ya li ser bingeha Netewya Demokratîk e, şaxê vê şoreşê berfirehtir bû. Şoreş bû li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê, êdî hemû pêkhateyên vê herêmê li ser fikir û felsefeya Rêbertî meşiyan. Hemû pêkhate li kêleka hev têkoşîna azadiyê dikin, karên hebeş bi hev re didin meşandin. Di heman demê de her pêkhateyek çand, ziman, bawerî û hwd… ji yên din cuda ye. Herwiha bi rengê jiyana hevbeş û wekheviyê dijîn. Ev yek nakeve bin berjewendiyên Peymana Lozanê. Peymana ku kurd û piraniya gelên Rojhilata Navîn heya roja îro jî ji ber siyaseta qirêj gelekî êş xwarin û komkujî di derheqê wan de çêbûn. Niha jî ji ber ku li gelên bakur û rojhilatê Sûriyê hevgitî ye dagirkeriya Tirkî Rêveberiya Xweser û pêkhatieyên wê dike armanc. Hevgirtina gelên herêmê me û bi gelê Rojhilata Navîn re wê Peymana Lozanê û hişmendiya desthilatdar ya sedsalî hilweşîne.”

**‘Pêwîstî bi yekrêziya kurdî heye’**

Cîgira hevseroka KNK’ê Hêvî Mustefa diyar kir ku ji bo Lozan careke din dubare nebe divê kurd bibin yek û wiha domand: “Gelê kurd divê Lozanê baş bixwînin û nas bikin. Herwiha nekevin wan kêmasiyên beriya sedsalî bûyî, da ku dîrok dîsa dubare nebe û ev kêmasî nekevin xizmeta dijmin. Di vê pêngava hestiyar de pêwîstiya me bi awayekî lezgîn bi istîratîciyeke netewî kurdî heye ku gelê kurd hemû li hember dijminan bibin yek. Em dizanin ku pirsgirêk li hember nêzîkatiyên Kurdî- Kurdî derdikevin pêş. Ev pirsgirêk jî ew e ku em hev qebûl nakin, ku ev birsgirêk jî yek ji siyasetên dijminên me ye. Lê ji ber ku ger Peymana Lozan dubare bibe wê xeteriyeke pir mezin ji bo tevaya gelê kurd li her çar paçeyan bîne. Em weke KNK`ê niha gelek hewildanê xwe dikin ku hemû partiyên siyasî yên tevaya Kurdistanê bicivînin. Herwiha pirsgirêkên dikevin pêşiya çêbûna yekrêziya kurdî çareser bikin. Di heman demê de her aliyek li dijî gelê xwe, dixizmeta dijminan de kar neke.”

# Çi ji bo jinê paşeroj e?

**Nehîr Pale**

Di nava civaka cinsiyetparêz de heyanî kîjan astê wê paşeroja jinê hebe, divê mirov dest pê bikê lêkolîn bike. Ji Dîroka 5 hezar sal BZ. ve zîhniyeta mêr serweriya xwe li ser jinê ferz dike û çarenûsa wê diyar dike. Ji bo jinê ya baş çi ye, wê çawa bijî û çi ji jinê têxwestin hemû bi rêbazê nivîskî û devkî di zakîreya civakê de dane rûniştandin. Li gorî zîhniyeta mêr bêdengî ji bo jinê tişta herî baş e, çiqasî li gorî zagon û daxwazên zîhniyeta mêr biçe wê serkeftî bijî û heyanî kêliya dawiya ku ew saxbe ji wê têxwestin ku xizmeta hevjînê xwe bike.

Dema ku mirov li buyerên di nava civakê de diqewimin binêre, jin bêdeng jî be, li gorî civak dixwaze biçe û xizmeta mêrê xwe jî bike, dîsa paşeroja wê wendayî ye, ji ber heyanî dimre rehetî jê re nîne, wê her tim jiyana wê li gorî tişta li ser tê ferzkirin, bidome.

Jin ji roja ku jidayîk dibe mîna ku nêzî lawikan dibin nêzî wê nabin, her tim lawik ê girînge, ew ê di rojên pêşde neslê êl û malbatê berdewam bike, jin jî wê bibe ya xelkê. Hîna temenê jin nebûye 5 sal malbat di bin navê terbiye, yan hezkirin an jî parastin destpê dike zagonan ji jinê re datîne. Ev zagon gelekî tûnd in û di encama wê de bi jin re şikestinên gelekî kûr çê dibin. Rêber APO di vegotina dîroka jinê de dibêje ku jin bi 3`ê şikestinan re derbas dibe, yek dema Sumeriyan, yek di dema Olên Yek Xwedayî de û ya dîtir jî di dema Kaptalîzmê de ye. Jina ku 5 hezar sal BZ. şikestî ye gelo wê paşeroja wê çi be yan jî wê çi paşeroja wê be? Ma qey di koletiyê de paşeroj heye? Yan jî dema ku jin dibe xwedî şehade, yan agahî li cem çêdibin û dibe xwedî tecrûbe an bi mêrekî zengîn re dizewicê yan bibe xwedî mal û mulk dikare bibêje ev paşeroja min e û ez kêfxweş im? Dibe ku jinên paşeroja xwe di vê yekê de dibînin, heyanî qirika xwe di nava koletiyê de fetisî ne û dibin sedema jin zeyîf bimîne yan bikeve helwestên wê di giyan û can de wenda bike.

Ev nebûye demeke dirêj buyereke giran qewimî, di wextê ku navbera jin û hevjînê wê de pirsgirêk çêdibe, ew di encama nîqaşeke dijwar navbera wan de agir berdide bedena xwe û giran dişewitê, ji xwe destpêke namirê, wê radikin nexweşxanê lê li gorî gotinên derdoran ew li nexweşxanê namîne û vedigere mala xwe, ji xwe qey 8 roj derbas nabin û ew jin wefat dike. Jina ku hinek zagonên civakê qebûlnake jî direve van rêbazan û dawî li jiyana xwe tîne.

Heyanî ku rêbazên lêdan, îhanet, girtin, tecawizkirin, kuştin, recimkirin û intîhara jinan hebe, paşeroja hemû jinan jî nîne û wê dawiya wan mirineke rezîl be. Di nava cinsiyetparêziyê de lêgera li paşerojê xeletiyeke mezin e, tenê paşeroja jin têkoşîn e.



# Sîyabend û Xecê

Rengê tîr di destanên evînê de trajedî ye.Ji xwe trajediya di evînan de hiştî ku ew destan bê mirin û mayînde bibin.Ev rastî bi heqîqeta civakê ya piştgiriyê,mihrîbanî û dilovaniya civakî, ji helê din ve xewjînên(xeyal û daxwazên kesan) kesan ve, ku nigihane û nikarîne bijîn û di hinava wan de maye, bi jînkirin û dilşewatiya bi ser evîndaran ve, ku civak bi wan bûye civak,ve girêdayî ye.

**Cîger EFRÎNÎ**

Tişta balkêş ew e ku,di hemû destanên evînên Kurdan de pêşiya pêşîn mêr dimire û piştre jî jin bi awayekî dawî li jiyana xwe tîne.Mem dimire, Zîn xwe dikûje, Derwîş dimire Edûlê xwe dikûje,Siyabend dimire û Xecê xwe dikûje.

Çima?

Bê guman sedema sereke jin bi evîna xwe ve girêdayi ye û bêyî evîna xwe jiyaneke din ji xwe re qebûl nake,hebûna xwe di evîna xwe de dibîne. Mêr dikare piştî evîndara wî bimire bi jineke din re bizewice. Lê heman derfetê nade jinê ku bi mêrekî re bizewice. Ango feodalîta ku di civakê de sedestbû rê ji jinê re digirt.

**Siyabend û Xecê destanenke evînê ya Kurdan e.**

Di nav destanên evînê de ya ku bi têkoşînê welidiye û têkoşîna hebûna xwe daye û bi wê rastiyê kemiliye û bûye malê civakê bi tenê destana evîna Siyabend û xecê ye.

Gava em hinekî li ser hûr dibin û hinekî rewş û kesayeta Sîyabend û Xecê vedirşînin,em bi awayekî zelaltir dibînin ku di her hêlê de destana Siyabend û Xecê destaneke civakî,welatparêz û tê de jin bi rengê xwe heye.Lê ji ber rewşa civakî ya feodal di wê de jî rengê mêr li destanê ketî.

Sîyabend sêwî li cem ap û amojina xwe mezin dibe. Xecê xwîşkeke ku bi heft birayên xwe re jiyan dibe li zozanan û bi her awayî rûmeta xwe diparêze,gava Siyabend fêm dike ku Xecê bi dijminê bêyî ku dudilî bibe hema li dijî diminên Wê têdikoşe û hevîrê evîndariya xwe bi têkoşînê distrê,

Ji vir fêm dibe ku Sîyabend kesayeta xwe û rêgeha jiyana xwe bi xwe, bêyî ku xwe bispêre bav, ap, xal an jî hêzekê, vedike. Wekî her tiştî, evîndariya xwe jî bi têkoşîna xwe di dilê Xecê de diçîne. Di jiyana rojana de, li zozanan rastî Xecê hatî, bi çavên serê xwe (ne wekî Memê di xew de)dibine, ango evîndariya wan zaroka têkoşîneke jiyanî ye. Ji hêla din ve Xecê hema dilê xwe radestî Siyabend nake,şertên xwe û rastiya jiyana xwe vedibêje.Hem li hember heft birayan, hem jî li hember Siyabend xwedî sekeneke raste,ne stûxwar e.Di nav destanên Kurdan de mirov bi tenê şertê evîna rast di kesayeta Siyabend û Xecê de dibîne.Evîn, li ser kesayeteke xwe bi xwe gihandî, bi rastiyên jiyanê ve hatiye keljandin û bi têkoşînê mezin bûye,derdikeve pêşiya me.

**Sîyabend zordariya ku amojina wî lê dike, qebûl nake**

Gelek zarok sêwî dimînin. Ev,rastiyeke jiyanê ye.Mixabin,gelek ji wan zarokan li kolanan dimînin û ji bo zikê xwe têr bikin tiştekî ku nakin tuneye û wekî awareyan mezin dibin.Lê di kesayeta Siyabend de awaretî tuneye,tam berevajî wê,kesayeteke bi çand û bi kedê mezin bûye,dev ji xwe berneda ye,çarenûsa xwe bi xwe diyar dike,derdikeve pêşberî me.Diçe li cem hesinkarekî dişuxile û fêrî çêkirin û bi karanîna şûr û siwarbûna hespê dibe.Yanê serê xwe ji çarenûsa ku jê re ji hêla felekê ve hatiye hûnandin danaxe.Di rêwîtiya jiyana mirov de ya girîng ne tora ku felekê hûnandî ye,ya girîng ew e ku mirov çawa û bi çi awayî hewl daye ku rêya xwe bi xwe veke.Ev e,em dibînin ku Siyabend bi kedeke mezin xwe fêrî her tişta ku pêwîstiya wî pê heye,dike û li gorî dema xwe,ku di serdemê de fêrbûna bikaranîna şûr,siwarbûna hesp û şerkirin,ji bo mêrekî şertên ku nebe nabe, û Siyabend di demeke kurt de û li



gorî temenê xwe pir zû fêr dibe ku, jiyan ne tiştekî hêsan e.Ew,ne wekî Memê bi heqîbeyên dagirtî zêr,zîv û mûcewheran nakeve rê,pênc qûriş di berîka wî de tune ne,Ji her alî ve kurmanc e û xêzane. Zexeliyan di karê xwe de nake. Yanê ne zarokekî çavpehn e, û bêxîretiyê jî layîqî xwe nabîne.Ango Siyabend,xwe bi xwe afirandî û bûye Siyabend,ne kesî ew kirî Siyabend. Siyabend;Zarokê ku kariye kefenê felekê biçirîne û bi xwe xêzên çarenûsa xwe binivisîne.

Rê li ber karmendên dewleta Elî Osman ên bacê berhev dikin,digire û ji wan dixwaze ku careke din lingên xwe navêjin hêremê.

Di vir de welatparêziya Siyabend derdikeve pêşiya me.Bi rêgirtina li ber karmendan û ji wan xwestina “careke din wan li vê hêremê nebîne“bi awayekî vegirî sînoran ji wan re diyar dike ku,“ev der welatê min e“ û divê li gorî wê rastiyê tevbigerin.War;Çiyayê Sîpanê Xelatê,ango Xerzan;Kurdistan e.Di vê xalê de cudahiya Siyabend ji Mem û Derwêşê Evdê derdikeve holê.Ew,ne li dijî êlekê,li dijî dewleta dagirker derdikve;bi temamî karmendên dewleta Elî Osman digire hemberî xwe.Rêgirtina li karmendên dewletê tê çi wate yê baş dizane û dizane ku,bi wê kiryara xwe kefenê mirinê li xwe dike û gengaze ku her kêlî were kuştin.

**Siyabend;hem ji boyî evîna xwe û hem jî ji boyî welatê xwe mirinê digire ber çavan!**

Wekî ku tê zanîn,destana Memê Alan destaneke ku ji Huriyan ma ye û Ehmed‘ê Xanê li gorî dîtin û felsefa xwe ji nû ve ew destan hûnandiye.Ancex destana Siyabend û Xecê di rastiyê de hatiye jiyankirin …

Pêre û tiştên ku ji karmendan girtine tev li gundiyan belav dike. Alîkariya kesên pêdiviya wan bi alîkariyê heye,dike.Di vir de jî Siyabend ji Memê Alan cûda dibe;Memê Alan xwedî heqîbeyên zêr û zîvan e û ji gel,rastiya gel qut e. Încax Siyabend kêliyekê jî ji civakê qut nebûye.

**Heft birayên Xecê hene!**

Heft zilam (Bira) bi Xecê nikarin. Xecê jî sêwiye û li cem heft birayan jiyana xwe didomîne.Lê Xecê ne xwe û ne jî giyana xwe radestî “dilovaniya“ birayan nekirî ye.Bi qasî hêza xwe têdikoş e û bi wê têkoşînê bûye xwedî kesayet. Ne wekî Edûlê ye, ku serê xwe ji daxwaza bavê re daxistî û di konan de najî.Ne wekî Zîna Zêdane serî li ber bira danaxe û di qesr û qonaxan de jî najî. Li zozanan dijî. Jiyana li zozanan paqij e û Xecê bi wê paqijiya zozanan giyan û hebûna xwe diparêze . Di hebûnê de paqij e û ji bûyîna xwe tiştekî wenda nake.Ne bi tenê wekî xwişkekê,wekî dayîkekê jiyan dike. Ev rastiya,giranbûna barê jina Kurd raber dike.Tu jinbî,di hemû serdeman de barê te giran e û divê di bin barê giran de lingên te nericifin. Ne bi tenê lingên te nericifin,her wiha divê kesayeta xwe jî biparêzî. Û heger bibî evîndar (yar),wê demê divê bizanibê ku,piştî mirina evîndar(mêr),tu jî dimirî! Ji lewra an nebî evîndar an jî bi mirina piştî mêr qayîl be!Ya rast, her çiqas pergala Feodalîte derfeta jiyanê ji jina ku ji xortekî re bûye evîndar nade jî,lê jineke ciwan û xweşik heger bixwaze dikare xwe nekuje û di koşeyekê de “bijî“.

Wekî tê zanîn pezkofî bi qiloça xwe li Siyabend dixe û ji jor ve dikeve,Xeçê kêndiran ji heft gundan kom dike,lê nikare Siyabend xelas bike.Porê xwe jî qut dike û bi ser kêndirê ve girê dide,lê dîsa jî. Nagihê Siyabend.Herî dawî xwe diavêje cem Siyabend,destê Wî digire û bi hev re can didin.Qutkirina por xwedî wateyeke girînge di çanda Kurdan de. Jinek zû bi zû porê xwe qut nake.Kofiya serê xwe navêje.Her çi qas encam trajedîkbe jî,evîna xwe bê mirin kirin û heta îro hatiye.

Heger Ehmed‘ê Xanê xwedî agahîba ( Piştî Ehmed‘ê Xanê qewimiye û ji lewra derfeta ku Ehmed‘ê Xanê jê agahdarbe tine ye),wê destana Siyabend û Xecê bihûnanda û ew wekî destana evîna Kurdan pêşkêşî civaka Kurd û mirovahiyê bikiraba.

# Ji bo bîranîna Cemîle

**Pirtûka çîrokan a bi navê “Berçem” ku Hasan Kiliç ê li Hepsa Ewlehiya Bilind a Eregliyê tê ragirtin, ji bo bîranîna Cemîle Çagirgayê nivîsandiye, hate çapkirin.**

Hasan Kiliç di qawîşa yekkesî de tê ragirtin. Wî “Berçem” bi Kurdî nivîsandiye û pirtûk ji Weşanên Sînê derketiye. Pirtûka çîrokan ji bo bîranîna Cemîle Çagirga ya 10 salî hatiye nivîsandin. Cemîle sala 2015 dema qedexeyên derketine derve ya Cizîrê de hatibû qetilkirin û ji bo ku cenazeyê wê xera nebe bi rojan di sarincê de hatibû parastin. Di pirtûkê de çîroka “Berçem” a li Kurdistanê hatiye dinê û hê ku hînî Kurdî nebûye û bi malbata xwe re diçe Stenbolê û 6 sal şûnde vedigere mala xwe û piştî wê fêrî zimanê kurdî dibe. Besna Acû û Mûstafa Temel jî ji bo çîrokan




wêne xêz kirine.

**Hasan Kiliç kî ye?**

Hasan Kiliç di sala 1994’an de li gundê Mistefamillik ê navçeya Qosera Mêrdînê hate dine û di sala 2016’an de tev li Yekîneyên Parastinê yên Sivîl (YPS) bûye. Di encama lêketina birûskê de Kiliç bi giranî birîndar dibe û hevalên wî ji bo dermankirina birînên wî ew birine Başûrê Kurdistanê. Li wir hatiye dermankirin. Rewşa Kiliç giran bûye û nekariye bimeşe jî. Li ser vê yekê malbata wî xwestiye Kiliç bîne cem xwe û li wir derman bike. Bes pêşmergeyên PDK’ê Kiliç li deriyê Xabûrê teslîmî Tirkiyeyê dikin. Kiliç piştî binçavkirinê hatiye girtin. Dadgeha 3’yemîn a Cezayê Giran a Mêrdînê bi hincetên “Endamtiya Rêxistinê”, “Xerakirina Yekîtî û Temamiya Dewletê” û sedemên wekhev, 3 caran cezayê mûebeda girankirî li Kiliç tê birîn. Kiliç niha di Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Eregliya Konyayê de tê ragirtin û Kiliç li girtîgehên Şirnex, Mêrdîn, Sêwereg û Kayseriyê jî maye.

# Rêwiyê riya azadiyê...(2)

**Fehîma Deştan**



Di sala 1989'an de ji bo tekoşîna çekdarî tevlî nava refên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê ARGK'ê dibe û derbasî qadên çiyayê Kurdistanê Botan dibe. Li herêma Elkê, Qaşûra, Metîna, Feraşîn û Herûrê xebatên leşkerî dide meşandin.Li Feraşînê xebata nav gel jî dide meşandin. Di 7'ê Nîsana 1990'î, li herêma Elkê, Komata tevî yekîneya xwe, dijmin û çeteyan oparasyoneke bê yeman bi ser wan de tînin. Oparasyona ku di encama sîxûriya çetan de, bi çend bendan li derdora wan digerînin û wan dikin çemberê de. Piştî pevçûnên dijwar û berxwedaniyeke bêhempa, li hemberî çete û leşkeran hin hevalên ku birîndar bûne dîl dikevin destê dijmin de. Huseyîn û du hevalên xwe ji bi birîndarî dîl dikevin destên çetan de. Çete îxaneta xwe kûrtir dikin û wan radestî dijmin dikin. Dijmin wan bi awayekî hovane li Beytuşebabê pêşberî gel îşekence dike. Da ku wan li pêşberî gelê Elkê radest bigire û di bin ala Tirkan re derbas bike, ruhê wan ê azadixwaz teslîm bigre. Lê tevî işkenceyeke dijwar jî, Hevalê Huseyîn ku di destpêka tevlîbûna xwe de berxwedana milîtanên PKK'ê ji bo xwe mînaka sereke girtiye, tîne bîra xwe û wê xwesteka dijmin pêknayîne û helwesta xwe ya mîlîtantiya PKK'ê li wir nîşan dide. Dijmin wan bi birîndariyeke giran û serhişçûyî, derbasî zindana Amedê dike. Huseyîn Şawîş li hemberî îşkenceya dijmin a hov, teslîmbûn û bêmoralbûnê qet qebûl nake. Şop û rêka berxwedaniya milîtanên PKK'ê bi helwesteke zelal nîşan dide. Bi rewşa xwe ya birîndarî tê darzandin. Li hemberî zilm û bêmafiya dijmin di zindanê de bi moral tevlî jiyanê dibe. Di warê îdeolojîk de xwe kûr dike, ruhê milîtanê pêşeng, bi sekneke ku layîqî xeta rêxistinê bibe pêşkêş dike û dijî. Pênûsa xwe ya dengvedan û hizrên azadiyê bi rewşenbiriya Kurdekî azad, di meydanên rastiya dîrok û çanda Kurdî de dibezîne. Bi nivîsên wêjeyî, teorîk, lêkolîn, helbest, çîrok, werger û ramanên xwe, dîwarê dîlbûnê dirûxîne. Pênûsa xwe bi zanyarî helwesta têkoşîna gelê Kurd, xweşikbûna welat, ziman, çand, jiyan, helbest, çîrok, lêkolîn, şano, filiklor û rewşenbîriya azad xemilandiye. Xeyalên xwe bi wêjevaniya jiyanhezekî li asîmanên Kurdistanê firandiye.

Piştî 15 e sal û 6 mehan ji zindana Tirkan derketiye û derbasî Rojavayê Kurdistanê, cihê serpêhatiya xwe dibe. Lê belê rêjîma Sûriyê dijwariya li hemberî kadro dide meşandin, qet wî rehet nahêle. Her roj lêpirsîn û tengasiyên curbicur derxistiye pêşberî wî. Careke din berê xwe dide mêrg, zozan û bilindiya çiyayên Kurdistanê. Bi coş û heyecaneke bêriyê tevlî xebatên gerîla dibe. Rêka gerîlatiya xwe berdewam dike. Li nav jiyan û erkên xwe de, pêşengtî, ruhê hevaltiya PKK'ê jiyaye û daye jiyîn. Bi qedandina dewreya perwerdeya PKK'ê, di rêveberiyê de cihê xwe digre.

Bi çirsandina şoreşa Rojava re, cih di nav amadekariya şoreşê de digre. Helwestên şoreşgerî, milîtaniyeke derwêşane, bi ruhê milîtanên PKK'ê yê hemdem, bi coşa şoreşê re tevgeriyaye. Seranserî qada şoreşa Rojava kar kiriye. Bi coşa şoreşê û pêşveçûna tekoşînê re kêlî bi kêlî çalakiya pêngavê di siyaset û wêjeya xwe de nîşan daye. Pêşengtî, rewşenbîriya demê, wêjeya bedewiya Kurdistanê, çand, filiklora Kurdî hûnandiye. Kesayeteke milîtan di jiyîn û nivîsa xwe de pêkaniye. Bi vîn û berxwedanê li hemberî paşverotiyê, parastina nirxên tekoşînê li dijî kes û tevgerên dilnexwazên şoreşê nîşan daye. Xeta îxaneta PDK'ê bi helwest û sekineke zelal, bi nivîs û nêrînên xwe, eşkere kiriye. Di qada perwerdekirina gel û kadro de roleke sereke lîstiye. Ji bo mayendekirina nirxên şoreşê, avakirina kesayet û jiyana nû, erka xwe bi awayekî layiqê şoreşê bi cih aniye. Merem û xwesteka gelê kurd ê azadîxwaz, bi hestiyariyeke mezin û lez şopandiye. Bi dijwariya şoreşa Rojava re li hemberî hevkarî û kevneperestiya li Kurdistanê bi xîtabên zelal û pênûsa xwe di kovar û rojnemeyan de êrîşên li ser şoreşê eşker kiriye. Weke milîtanekî PKK'ê bi xîtabê xwe yê xurt di nav gel de tevgeriyaye. Di qada rêxistinî, leşkerî û rewşenbîriyê de bi awayekî çalak xebitiye. Da ezmûna xwe yên salan li nav PKK'ê jiyayî û şahîdiya gelek dem û cihan kiriye mayende bike, bi biryar dest bi lêhûrbûn û amadekariya nivîsandina romana Serok Apo kiriye. Bi berfirehbûna şoreşê re fermandarî û perwerdeya fikir û ramanên Rêber Apo ji bo piradîgma nû, avakirina konfedaralîzma demokratîk mayende bibe, bi zihniyeta şerê gelê şoreşgerî, hêzên YPG'ê, û gel perwerde kiriye. Ji bo pêşengtiya bîrdozî, siyasî di destpêka pêngava Rojava de, di xebatên qada civakî û zimanê kurdî SZK' de rola pêşengtiyê lîstiye. Her wiha di nav xebatên TV DEM, Zanist û Ronakbîrî, Komîteya perwerdeya hêzên leşkerî, berdevkiya hêzên parastinê û xebatên rêxistinî kiriye. Bi dirêjiya temenê xwe yê di nav şoreşê de hem li nav gel, çiya, zindan û ji destpêka tevlîbûnê ta avakirina şoreşa Rojava, bêrawestan xebat daye meşandin. Di fikir, zikir û çalakiyê de xwe gihandiye asta kadroyekî pispor. Di damezirandina SZK'ê de roleke şînber lîstiye. Da ku tekoşîn û çand û zimanê Kurdî mayende bibe, di pêşxistina zimanê dayîkê de pêşengtî û rêveberiyê de cih girtiye. Kedeke bêhampa ji bo parastin û pêşxistina ziman daye meşandin. Di qada rewşenbîriyê de jî bi pênûs û helwestên rewşenbîr û milîtanê PKK'ê gelek xebat daye meşandin û roleke sereke girtiye ser milê xwe. Li her cihekî ku lê bûye, bi uslub û xîtabgerekî xurt perwerde û civîn pêkanîne. Milîtantiya PKK'ê, bi pênûsa xwe ya bi leza demê re diherikî, raman û çalakiya rast diyar kiriye. Timî weke rewşenbîrekî welathez, aşiqê doza azadiyê, bi helwestên xwe yên radîkal di her qada jiyanê de nîşan daye.

Di 19'ê Tîrmeha 2016'an de dema ku ji civînên salvegera pîrozbahiya şoreşa Rojava ji hêzên parastinê re pêktîne, bi qedandinê re ber bi bajarê Dêrika Hemko ve diçe, rûbirûyê qezayeke bêtalî tê û bi giranî birîndar dibe. Ta ku digihîje nexweşxaneya Dêrikê, jiyana xwe ji dest dide û tevlî karwanê şehîdan dibe. Ji destpêka tevlîbûnên Rojava ta avabûna şoreşê, bêsekin têkoşiyaye û bi hezaran bîranîn û merema hevalên xwe yên şehîd nivîsiye û mayende kiriye. Lewra yek ji wan rêhevalan e ku li du xwe gelek şopên nirxdar hiştiye. Li pey xwe dîrokeke bi çek, pênûs, raman û baweriyê ve dagirtî hiştiye. Kesayetên wiha şoreşa me zindî hiştine û rê nîşan dane. Lehngekî ku ji destpêka tevlîbûnê, ta avabûna şoreşê, şervanekî canbexşane bû. Bi qasî leza pêlên Dicle bê ku navber bide di nav tekoşîna azadiyê de û di her qelîştokekî tihnî bûyî de, bûye dilopên ava vejînê. Milîtantiya PKK'ê bi awayekî layiqê gel û partiyê jiyaye. Bi xatirekî xemgîn ji warê serpêhatiya xwe bar kiriye.

# Komkujî nikarin vîna gelan bişkînin

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**7 sal di ser komkujiya taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo re derbas bûn, lê hîn jî êşa komkujiyê di dilê malbatê qurbaniyan de ye û nehatiye jibîrkirin. Malbatên şehîdên komkujiya taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo dan zanîn ku têkoşîna gelên herêmê û berxwedanan zarokên Rojava, plan û armancên çeteyan vala derxistin.**

Di 27'ê Tîrmeha 2016'an de li taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo, kemyoneke bombarkirî ya çeteyên DAIŞ`ê bi teqîneke dijwar bajêr hejand û zêdeyî 50 kesî şehîd bûn ku têde Zarok,ciwan, kal û pîr hebûn.Herwiha 177 kes birîndar bûn, piştî lêgerînan jî nasnameya hin kesên qurbaniya komkujiyê windayî man.


Derbarê salvegera 7`an a komkujiya taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo, malbatên qurbaniyan ji rojnameya me re axivîn.

Bedriya Ezîz Osman dayîka Şehîd Mihsin Osê derbarê komkujiya ku bi xwe re jiyana kurê wê yê bi temenê 29 salî bi dawî kir wiha got: "Kurê min li firoşgeheke mobîliya ku li taxa Xerbî ye kar dikir, di sibeha kumkujiyê de çû ser karê xwe, piştî derbasbûna demeke kurt ji çûyîna wî ya ser kar, dengê teqîneke dijiwar li



bajar hat bihîstin. Agahî hat belavkirin ku komkujiyek li taxa Xerbî pêk hat, di encama wê teqînê de kurê min jiyanan xwe ji dest da."

**'Komkujiyê dilê welatiyan birîn kir'**



Mihsin Osê

Dedriya Osman axvitina xwe wiha qedand: "Tevî derbasbûna roj, meh û salan jî, êşa qurbaniyên komkujiyê ji dilê me derneket, herwiha ev komkujî bû birîneke bê derman ku ji bîra xelkên Qamişlo qet naçe. Komkujiya ku bi destê çeteyên DAIŞ'ê pêk hat, bû sedema êşekê di dilê bi 100`an malbatan de, destê me ji zarokê me kirin, dilê welatiyên Qamişlo bi ewrekî reş nuxmand. "

**'Armanca komkujiya Qamişlo têkbirina vîna gel bû'**

Welatiyê bi navê Şêrewan Şêxo ku xwşka wî û du zarokên wê jî di komkujiya taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo de şehîd bibû, êşa dilê xwe wiha anî ziman: "Xweşika min Emîra Şêxo û zarokên wê Kasro, Peljîn di



Nafiya Hacî Hacî



Seyid Şikirî

komkujiyê de Şehîd bûn. Armanca çeteyên DAIŞ`ê ji pêkanîna komkujiya taxa Xerbî, têkbirina vîna gelên herêmê bû."

**'Planên faşîzmê bi hevgirtina gelên herêmê têk çû'**

Şêrwan Şêxo di dawiya axaftina xwe de, banga yekîtiya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir û wiha got: "Pêwîste gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî komkujiyên ku tên kirin, bê hêz nebin.Herwiha bi hevgirtina gelan û saya têkoşîna keç û xortên me, tevahiya pilanên dagirkeriyê û çeteyan têk çûn. Ji bo wê pêwîste gel û hêzên leşkerî bi hev re xaka welat ji dewleta tirk a dagirker û çeteyên DAIŞ`ê yên qirêj biparêzin. Tevahiya pilanên li dijî gelên herêmê wê bi yekrêzî û hevgirtina gelên herêmê, wê têk biçe."

Welatiyê bi navê Seyid Şikrî ku dayîka



Bedriya

wî di komkujiya taxa Xerbî de jiyana xwe ji dest dabû wiha got: "Dayika min ji bo dermankirna diranê xwe çûbû cem Bijîşkê diranan li taxa Xerbî, nêzî seat 9'an de dengê teqînekê mezin hat bihîstin. Di nava teqînê de dayika min jî Şehîd bû. Rola dayika min di civakê de hebû dermanê xwezayî çêdikirin û gelek nexweş li ser destê wê dihatin dermankirin. "

**'Yekîtiya gelan bersiva herî xurt li dijî komkujiyê bû'**

Seyid Şikrî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev komkujî ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve pêk hat, daxwaza wan qirkirina gelê kurd bû. Ji ber çeteyên DAIŞ`ê jî hevkarê dewleta tirk a dagirker re, ji aliyê dewleta tirk ve derbasî xaka Rojava dibin û planên dagirkeriyê dimeşînin."



# Ji bilî îradeya kurdan ti peyman nayê qebûlkirin

## Encamnameya Konferansa dîrokî ya 2 rojan hate eşkerekirin ku nûnerên Kurdan li bajarê Lozanê di salvegera 100'emîn a Peymana Lozanê de lidar xistin.

**Navenda nûçeyan**

Bi wesîleya salvegera 100'emîn a Peymana Lozanê bi beşdariya zêdeyî 600 delegeyî yên ji çar parçeyên Kurdistanê li Salona Konferansê ya Beaulieu ya Lozanê bi sernavê "Di 100 saliya Peymana Lozanê de Kurd û Kurdistanî em li Lozanê ne û Peymana Lozanê qebûl nakin, red dikin" konferansek hate lidarxistin. Konferansê du rojan dewam kir û encamnameya wê hate eşkerekirin.

Li pêşiya avahiya Lozan Ouchy ku hevdîtinên li ser Peymana Lozanê yên beriya 100 salî lê hatibûn kirin, civîneke çapemeniyê hate lidarxistin û encamnameya konferansê hate eşkerekirin.



spasiya Şaredarê Lozanê kir ku destûr daye çalakiyên li Lozanê yên çar rojan hatine kirin.

**Kurd wê tu peymana ku vîna wan qebûl neke nepejirînin**

Di encamnameyê de hate ragihandin ku Peymana Lozanê ji derveyî îradeya gelê Kurd hate îmzekirin û gelê Kurd li dijî vê yekê 100 salên ku tekoşînê dike û ev peyman qebûl nekirin. Ji raya giştî ya cîhanê re hate ragihandin ku Kurd wê di sedsala nû de jî ti peymana li derveyî îradeya xwe qebûl neke.

Di dema xwendina encamnameyê de Hevserokên KNK'ê Ahmet Karamûs û Zeynep Mûrad daxuyanî dan.

Karamûs wiha got: "Peymana 100 sal berê li vir hatiye kirin, li dijî vîna gelê Kurd hatiye kirin. Li ser qedera gelê Kurd rewşek gelek xirab derxistiye holê. Hemû partî û nûnerên gelê Kurd, akademîsyen, rewşenbîr û hunermend 4 roj in li Lozanê li ser vê peymanê nîqaşan dikin. Di konferansê de nîqaşeke berfireh a hiqûqî û siyasî hate kirin. 100 sal berê qedera gelê Kurd berevajî kirin. Em gelê Kurd ji bo sererastkirina vê xeletiya dîrokî îro li vir in."

Hevserok Zeyneb Mûrad jî got: "Peymana Lozanê ya 100 salî êş û komkujiyên mezin anî ji gelê me re" û axaftina xwe wisa domand "Di encama têkoşîna gelê Kurd de îro em li vir in û em dengê xwe digihînin cîhanê. Gelê me 100 sal in li 4 parçeyên Kurdistanê li ber xwe dide. Ji bo parastina ax û nasnameya xwe li ber xwe dide. Ji bo demokrasî û aştiyê li ber xwe dide. Îro hemû nûnerên gelê Kurd li vir in. Em ji hemû cîhanê re dibêjin, em Lozanê qebûl nakin. Em naxwazin Lozan bidome. Gelê me wê Lozaneke nû qebûl neke. Hemû gelên cîhanê û gelên Rojhilata Navîn dizanin ku em gelê Kurd me tu carî Lozan qebûl nekir."

Zeyneb di dawiya axaftina xwe de

**Encamnameya Konferansa Lozanê bi vî rengî ye:**

"Ji ber salvegera 100'emîn a Peymana Lozanê, di 22-23'ê Tîrmeha 2023'an de bi beşdariya rêxistin û partiyên Kurdistanî, gelek akademîsyen, hiqûqnas, rewşenbîr, nûnerên komên cuda yên etnîkî û olî û jinan li bajarê Lozanê yê Swîsreyê konferans hate lidarxistin.

Di konferansê de li ser encamên vê Peymana Lozanê ya nexêr hate rawestîn ku beriya 100 salî hate îmzekirin û maf û gelê Kurd înkar kir.

Di konferansê de rewşa herêmî û navneteweyî hate nîqaşkirin, işaret bi erk û berpirsyariyan hate kirin û hate destnîşankirin ku têkoşîna maf a gelê Kurdistanê rewa ye.

Di konferansê de bang li wan dewletan hate kirin ku mohra xwe danîn binê peymanê, ku piştgiriyê bidin gelê me û ji bo çareseriya pirsgirêka dîrokî ji hêzên dagirker re nebin alîkar.

Herwiha ji dewletên ku Kurdistan di navbera xwe de parçe kirine hate xwestin ku rê bidin çareseriya aştiyane ya doza gelê Kurdistanê.

Di konferansê de spasiya beşdaran hate kirin û biryar hate dayin ku ji bo şopandina biryarên konferansê komisyonek bê avakirin.

Di konferansê de li ser sê astên; navxweyî, herêmî û navneteweyî pêşniyar hatin kirin, biryar hatin wergirtin.

**Têkildarî asta navneteweyî:**

1. Li welatên ku Kurdistan hatiye parçekirin ji bo gelê Kurdistanê mafê xwe yê diyarkirina çarenûsê bi dest bixe, saziyên navdewletî piştgiriyê bidin daxwazên gelê Kurdistanê.
2. Di bin sîwana Neteweyên Yekbûyî de komisyoneke navneteweyî bê avakirin ku nûnerên Kurdistanê jî di nav de hebin. Ji bo meseleya Kurd bi rengekî aştiyane û diyalogê bê çareserkirin, ev komisyon têkiliyê bi aliyên Peymana Lozanê re dayne.
3. Ji bo Kurd di asta çavdêriyê de bibin endamê Neteweyên Yekbûyî kar bê kirin.
4. Dewletên ku Kurdistan di nava xwe de parve kirine ji ber sûcên ku li dijî gelê Kurdistanê kirine li dadgeheke navdewletî bên da-




rizandin, ji bo vê hewl bê dayin.
5. Saziyeke Neteweyî ya Hevpar a Kurdistanî bê avakirin ku di asta navneteweyî de karê dîplomasiyê bimeşîne.
6. Di nava 100 salên Peymana Lozanê de li dijî gelê Kurdistanê sûcên komkujî û qirkirinê hatin kirin. Welatên ku bûne aliyê peymanê ji ber van sûcan tazmînatê bidin. Garantiyê bidin gelê Kurdistanê ku careke din van sûcan dubare nekin. Ji bo cezakirin û qedexekirina van sûcan di asta navneteweyî de piştgirî were dayin.
7. Êrîşên hewayî yên li ser gelê Kurdistanê bi taybetî jî li Rojava bêne astengkirin. Li Konseya Ewlekariyê ya Navneteweyî 'qada li firînê qedexe' bê ragihandin. Hêzên Kurd li gel hêza aştiyê ya navdewletî li ser sînorê Rojava û Tirkiyeyê wezîfeya asayîşê bikin.
8. Ji bo girtiyên siyasî yên li Tirkiyeyê azad bibin, Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê zextê li Tirkiyeyê bike.

**Ji bo navxweyî:**

1. Parastin û pêşvebirina berjewendiyên neteweyî yên Kurdistanê di ser hemû berjewendiyên şexsî û siyasî de bêne dîtin.
2. Xwe ji nakokiyên siyasî yên navxweyî vegire, ji bo çareseriya nakokiyên navxweyî hewl bê dayin.
3. Dest li karên navxweyî yên parçeyên Kurdistanê neyê werdan û Rêveberiyên Herêma Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê bêne parastin. Rêveberiyên siyasî yên Başûr û Rojavayê Kurdistanê astengiyên di navbera xwe de ji holê rakin û di asta siyasî, aborî, civakî û çandî de têkiliyê ava bikin.

4. Bi beşdariya hemû dînamîkên neteweyî Yekîtiya Neteweyî ya Kurdistanê bê pêkanîn.
5. Ev konferansa mezin a Kurd û Kurdistaniyan ku bi wesîleya sala 100'emîn a Peymana Lozanê ya nexêr hate lidarxfistin, careke din bang li hemû rêveber û pêşengên gelên Kurdistanê dike ku wezîfeyên xwe yên neteweyî bi cih bînin, bêyî hincetan Tifaqa Mezin a Kurdistanê pêk bînin û bi vê armancê jî Konferansa Neteweyî ya Kurdistanê lidar bixin.
6. Jiyana hevpar a gelên hindekahî yên li Kurdistanê bê parastin.
7. Ji bo hevjiyanê girîngî ji azadiya jinê re bê dayin.

**Têkildarî herêma Kurdistan lê hate parçekirin:**

1. Parçeyên Kurdistanê yên di nava sînorên Tirkiye û Sûriyeyê de hatine parvekirin bi rengekî fermî bi navê Kurdistanê bêne naskirin û li Tirkiyê û Sûriyeyê bi statuya ku bi xwe diyar dike bêne qebûlkirin.
2. Statuya xweser a Kurdistanê di nava fermiyeta navneteweyî de li Neteweyên Yekbûyî bê temsîlkirin.
3. Di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî de bi beşdariya nûnerên gelê Kurdistanê komîsyoneke navneteweyî bê avakirin, komîsyona navborî têkiliyê bi dewletên aliyê Peymana Lozanê re dayne, ji bo peydakirina çareseriyên konjonkturel rêyên diyalog û aştiyane bêna afirandin û bicihanîn.

4. Ji bo ev daxwazên konferansê bêne bi cihanîn komîsyoneke koordînatîf bê avakirin.
5. Ji bo karê dîplomasiya hevpar a Kurdistanê bimeşîne, komîsyoneke pispor bê avakirin û wezîfedarkirin.
6. Ji bo temsîliyeta Kurdistanê li Neteweyên Yekbûyî bê kirin, karekî xurt û bi hev re bê meşandin.
7. Ji bo şopandin û bicihanîna encamên konferansê komîte yan jî komîsyoneke pispor bê avakirin.
8. Ji bilî Komara Tirkiyeyê wê bi hemû dewletên aliyê Peymana Lozanê re têkiliya dîplomatî bê danîn ku neheqiya dîrokî bê telafîkirin û ji wan bê xwestin ku dawî li mexdûriyeta gelê Kurd û gelên Kurdistanê bînin.
9. Ji bo Peymaneke Navneteweyî ya Alternatîf bê çêkirin wê karekî çalak bê kirin.
10. Ji hikumeta Tirkiyeyê wê bê xwestin ku sozên têkildarî pêkhateyên ne misilman dane bêyî cihêkariyê bike bi cih bîne.
11. Êzidî hêmaneke esasî ya gelê Kurd e ku ne misilman e. Divê di kategoriya 'hindikahiyên ne misilman' de bên qebûlkirin, mafên ku ji Rûm, Ermen, Suryanî-Keldanî re têne dayin ji Kurdên Êzidî, Yaresan û Elewî re jî bêne dayin.
12. Ji hikumeta Herêma Kurdistanê û Rêveberiya Rojavayê Kurdistanê wê bê xwestin ku têkildarî encamên Peymana Lozanê û ji bo telafîkirina mexdûriyetên wê ofîseke taybet ava bikin.
13. Ji bo têkiliyên navneteweyî yên hevpar bê meşandin wê organeke dîplomasiyê ya hevpar a Kurdistanê bê avakirin.
14. Di serî de rêberê KCK'ê Abdullah Ocalan wê ji dewleta Tirkiyeyê bê xwestin ku hemû girtiyên siyasî bêşert û merc berde.
15. Ji Neteweyên Yekbûyî tê xwestin ku hêza aştiyê di navbera Rojava û Tirkiyeyê de bi cih bike.
16. Wê ji Neteweyên Yekbûyî bê xwestin ku ji bo temsîliyeta Kurdistanê ofîsekê di bin sîwana xwe de ava bike.",

# Şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa mirovahiyê ye

Hevseroka TEV-DEM’ê Rûken Ehmed di salvegera 11’an a Şoreşa 19’ê Tîrmehê de diyar kir ku civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê di nava şert û mercên herî zehmet de gavên mezin avêtin û karîbûn di çarçoveya sazî û dezgehan de xwe bi awayekî rêk û pêk birêxistin bikin. Rûken Ehmed da zanîn ku nirxên şoreşa 19’ê Tîrmehê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê sînordar nemaye û li tevahî Rojhilata Navîn û cîhanê bûye xwedî bandor.

Hevseroka TEV-DEM’ê Rûken Ehmed li ser rola TEV-DEM’ê û bandora wê di parastina nirxên şoreşa 19’ê Tîrmehê, bersiv da pirsên rojnameya ronahî.



**1-Şoreşa 19’ê Tîrmehê bingeha xwe civakî ye, TEV-DEM’ê çiqas xeta şoreşê didomîne?**

Xeta Şoreşê ya 19’ê Tîrmehê li ser esasê hevigirtin û yekîtiya civakî hatiye avakirin. Bi şoreşê re TEV-DEM jî hate avakirin. Di nava TEV-DEM’ê de hemû aliyên civakî cihê xwe girtin. Aliyên civakî, siyasî, çandî û her wekî din jî, bûn beşekî giring ê vê şoreşê. Di hemû qadên jiyanê de civakê xwe bi rêxistin kirin
Di aliyê leşkerî li ser hêmanê parastina rewa YPG/YPJ’ê xwe birêxistin kirin, partiyên siyasî tevgera xwe mezin kirin. Di hemû qadan de ev rêxistibûn roj bi roj mezinbû. Di sala 2018`an de jî TEV-DEM’ê xwe wekî civaka sivîl birêxistin kir û nûnerên hemû civakê ji bijîşkan bigre, cotkar, karker, endizyar, esnaf û siyasetmedaran jî xwe bi rêxistin kirin. Ev rêxistibûyîn li ser esasê parastina nirxên şoreşa 19`ê Tîrmehê hatiye pêşxistin û mezin bûye. Ev barê wê jî TEV-DEM’ê girtiye ser milê xwe û ji bo pêşxistina we bê navber di nava tevgerê de ye.

**2-TEV-DEM’ê ji bo pênasekirina sîstema civakî ya di herêmê de çi gav avêtine û pirojeyên wê yên dema pêş çine?**

Gavên ku hatine avêtin encamên wê ne, Niha 27 sazî û yekîtiyên civakî cihê xwe di nava TEV-DEM’ê de digrin. Hemû jî bi perwerde û xebatên rêxistinî ve cihê xwe digirin û pêş ve dibin. Endamên van yekîtiyan di akademiyên TEV-DEM’ê de perwerdeyê dibînin û cihê xwe di geşkirin û pêşveçûna xebatên têne kirin de digrin. Bê guman gavên gelekî mezin hatine avêtin. Him di warê pêşeyî û him jî di warê bîrdozî de çi li ser asta herêman û çi jî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giştî encamên wê berçav in. Di heman demê de ji bo sazî û dezgehên di nava Rêveberiya Xweser de cih digirin jî heman tişt derbasdar e.
Ev di warê perwedeyê de û di aliyên jiyanê de jî heman tişt pêkane. Perwedekirina mamosteyan, perwedekirina endizyaran, hiqûqnasan û her wekî din rolekekî wê ya mezin hebû. Rola wê jî di avakirina civakê û pêşxistina wê de hebû. Rola herî sereke pêşxistina pêşeyî û perwerdekirina endamên dezgeh û saziyan e.

**3-Yek ji lingên sereke yên şoreşa 19’êTîrmehê hevgirtina pêkhateyane. Piştî 11 salan, li ser asta sûriyê û heremê çi gav hatine avêtin?**

Şoreşa 19’ê Tîrmehê di Rojava de sînordar neme, bandora xwe li Sûriyê û tevahî Rojhilata Navîn û cîhanê belav bû. Gavên wê yên mezin bûn ilham û hêvî ji hemû gelên Rojhilata Navîn re. Me dît çawa piştî ku şoreşê destpêkir, sîstemên komîn, meclîs û rêveberiya xweser hatin avakirin.
Piştî encamên wê di herêmê de deng veda, bangê civakê li herêmên din jî çêbûn û ji bo parastin û avakirina rêveberiyên xweser hatin. Li ser esasê wan bangan kar û tekoşîn hate meşandin û di encamê de li herêmên din jî Rêveberiyên Xweser li ser asta herêman hatin avakirin. Hemû rêveberî jî di bin sîwana Rêveberiya Giştî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de cihê xwe digrin.

**4- plan û pirojeyên we yên dema pêş ji bo çareserkirina aloziyên civaka çine û di van planan de we çiqas ji ezmûnên şoreşa 19’êTîrmehê sûd werigritine?**

Plan û pirojeyên me di vê demê de ew e, ku em karibin di riya Yekîtî û saziyên di bin sîwana TEV-DEM’Ê de cihê xwe digirin gavan pêşve gavan bavêjin. Ev him di warê rewşenbîrî de, him di warê tenduristî û perwedeyê jî pêwîstiyek mezin e. Di heman demê de ji bo pêşeroja civakê û bi taybet di aliyê hêza parastina cewherî de, di hemû aliyan de jî armanc parastin û pêşvebirina civakê ye.
Ji ber piraniya saziyên civakî di bin sîwana TEV-DEMê de cihê xwe digirin. Sîstema me tenê li Rojavayê Kuridstanê nîne, lê belê êdî ev sîstem li tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi cih bûye. Nûnerên hemû civakê di nav de cih digirin, komeleya Tirkmen heye, Meclîsa Ermenî û nûnerên pêkhateyên din hene.
Di herêmên me yên rizgakirî de wekî Tebqa, Reqa û Dêrizorê de jî gel xwe di bin sîwana civaka sivîl de rêxistin kirine. Di nava saziyan de xwe bi rêxistin kirine. Plan û projeya me ew e di riya sazî û yekîtiyên xwe re zemîna yekîtî û hevgirtina civakê hîn mestir bikin. Di aliyê aborî de jî projeyên me hatine çêkirin, her yekîtiyek pirojeyên wan hene. Di wan yekîtiyan de bi hezaran endam cih digirin, ji bo em karibin van hîn zêdetir rêxistin bikin, pirojeyên me yên pêşerojê jî hatine plankirin.
Ji bo pêşeroja civakê ev piroje wê xizmeteke hîn mestir bikin. Di heman demê de sîstema me ya perwerdeyê hatiye pêşxistin.Hemû jî di bin sîwana Ekademiyên me yên perwedeyê de têne birêve birin. Civaka Sivîl van piroje û planan ber bi pêş ve dibin û her dem li ser esasê zanistana civakê mezin dikin. Ji ber bingeha hemû tiştî parstina nirxên civakê ye, xebatên me jî di wê çarçoveyê de pêk tê.



**5-Gelek alî dijberiya xeta şoreşa 19’êTîrmehê dikin û pêşxistina wê naxwazin, gavên we ji bo parastina nirxên şoreşê û pêşxistina wê çine?**

Esas parastina nirxên şoreşê mirov dikare bêje di milê hêza cewherî ya di pêngava şerê gel ê Şoreşerî de pêk tê. Ev di aliyê perwede û tenduristiyê de jî têne dayîn. Bi wate civak di tax, gund, bajar û komîna xwe de çawa dikare tenduristiya xwe biparêze. Nirxên hatine avakirin rastî gelek êrişan tê, ev êriş him ji derve û him jî ji hinder ve tême birêvebirin. Ji ber wê pêwîste kar were kirin, civak li warê xwe bimîne û koçber nebe.
Ji bona ku bikare li nirxê şoreşê xwedî derkeve û rê li ber şerê taybet ê li ser herêmê tê meşandin bigre û hewldanên dijberan ê li ser herêmê vala were derxistin. Dewleta Tirk niha rojane êriş dike, li hemberî van êrişan em dikarin çawa xwe biparêz in û li dijî wan êrişan derkevin. Bi taybet di çarçoveya xwedîderketina li Rêber APO, ev yek wekî aliyekî wê yê giring pêk tê. Wekî nimûne yekîtiya Parêzeran bi sedan endamên xwe yên ku xwedî li Rêber APO derdikevin û dixwazin parastina wî bikin. Çalakiyên cûrbecûr di vê derbarê de û di çarçoveya xwedîderketina li vê şoreşê derketin. Wekî parêzerên jin jî dixwazin xwedî li vî nirxî derkevin û hemû hêza xwe dixin dewrê.

**6-Ji bo destkeftî werin parastin û planên we bi serkevin çi ji pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyayê tê xwestin?**

BI rastî ji bo parastina nirxên şoreşê hemû gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ketin tevgerê, em dizanin yekîtiya gelan hêmanê bingehîn ê parastina nirxên şoreşane. Ji ber yekbûna gelan têkbirina desthildariyê ye. Em dizanin sîstema dewlatan her ji bo parçebûna gelan kar kirine û hîn jî dikin. Sîstema dewletan ji bo wê her di nava tevgerê de bû, çawa gelan parçe bike, planên wan jî her li ser vî esasî bûn.
Sîstema TEV-DEM’ê berûvajî sîstema dewletan e, hêmanê xwe yê bingehîn dispêre yekîtiya gelan. Em çiqas yekîtiya gelan biparêzên û pêk bînin em ê karibin hîn zêdetir nirxê şoreşê biparêzin. Li vir hemû pêkhate kurd, ereb, asûr, suryan û her wekî din jiyan dikin, hemûyan bi hev re ji bo parastina nirxê şoreşê berdelên mezin dane. Gelê me 12 hezar şehîd û 20 hezar birîndar dane, ya bingehê parastinê misoger dike rêxistibûne. Ji ber wê giringe em çawa sîstema xwe biparêzin û yekîtiya xwe pêş bixin. Sîstema civaka sivîl, sîstema parstina sivîl, jin, ciwan, perwerde û sîstema aborî giring e. ji ber parastina sîstema aborî tê wateya parstina nirxan. Di vê çarçoveyê de ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê parastina nirxan dikeve ser milê her kesî.

**7-Hêvî û pêşdîtinên we li ser xeta şoreşa 19’ê Tîrmehê çiye û baweriya we heye ku wê hîn ev rewş gelekî dirêj bike?**

Hêvî û bendewariyên me ji bo şoreşa 19’ê Tîrmhê gelek in, ji ber şoreşê di 11 salan de bi derfetên herî kêm karîbû xwe li ser piyan bihêlin. Kesên dixwazin azad jiyan bikin di pêşengtiya wê de cih girtin û ew birêve birin. Niha gelek anternasyonalîst hatine dixwazin ezmûna şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê fêr bibin û wê li welatên xwe pêk bînin. Ji ber wê jî niha erka me ye em şoreşê hîn pêş de bibin û mestir bikin. Îro hin herêmên me di bin dagirkiriya dewleta TIrk de ne, Efrîn û şehba gelê me di bin zulim û zordariya dewleta Tirk û çeteyên wê de ne, di heman demê de di bin dorpêça hikûmeta Şamê de ne. Li aliyê din jî herêmên Serêkaniyê û Girê Spî jî di bin dagirkeriyê de ne. Ji ber wê em ê, bi rihê şoreşa 19’ê Tîrîmeê pêş bixin û biparêzin û bi wî rihî bihêlin gelê me di herêmên me de bimînin û di welatê xwe de azad jiyan bikin. Gelê me yê bala hemû duniyayê kişand ser şoreşa ku bi pêşengtiya jin û ciwanan pêşket. Niha jî, bendewariya me ji gelê me û bi taybet jin û ciwanan ew e, ku parstina nirxên şoreşê bikin.



# Mihyedîn Hesen: Şoreşa 19’Tîrmehê şoreşa şehîdan e

Meclisa Malbatên Şehîdan, wefedara berdêlên Şoreşa 19’ê Tîrmehê ye, ku bi hemû jiyan û karîna xwe destekê dide malbatên şehîdan e. Girêdayî kar û xebatê Meclisa Mlbatên şehîdan Hesen got: Ku xwedîderketina li malbatên şehîdên şoreşê, erka me ye.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Meclisa Malbatên Şehîdan a bajarê Qamişlo, saziyeke civakî ye. Armanca wê ya sereke destekdayîna manewî û madî ji bo malbatên şehîdan e. Meclis mîna malekê ye û ji bo malbatên şehîdan û meşandina kar û barê malbatên şehîdan di sala 2010`an de hat damezrandin.
Herwiha meclisa malbatên şehîdan li Rojavayê Kurdistanê û tevaya bakur û rojhilatê Sûriyê jî bû yek ji destkeftiyên Şoreşa 19’ê Tîrmehê.
Meclisa Malbatên Şehîda ya Qamişlo jî, kar û barên malbatên nêzî 1000 şehdên şoreşê dimeşîne.
Hêjayî gotinê ye ku bajarê Qamişlo ji aliyê rojhilat ve heya gundê Tenûriyê girêdayî vê meclisê ye. Di heman mijarê de ji aliyê rojava ve, heya gundê Girbawî girêdayî Meclisa Malbatên Şehîdan e. Ev meclis, bi riya berdevkên xwe yên komînan, rewşa malbatên şehîdan dişopîne.
Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo nêzî 10 qomîteyan digre nava xwe, kar û xebatê xwe yê rêxistinî jî bi riya van qumîteyan dide meşandin. Komîteyên heyî jî ev in, Komîteya Jinê, Komîteya Şopandinê û hwd… Hejmara endamên meclisê û komîteyan, nêzî 50 endaman e. Herwiha ev komîte ji bo şopandina rewşa giştî ya malbatên şehîdan û xebatên lidarxistina çalakiyên weke merasîm û bîranînên şehîdanan dide meşandin.




Di derbarê kar û xebatên Meclisa Malbatên Şehîdan de,yên di pêşveçûna Şoreşa 19`ê Tîrmehê de, endamê Meclisa Malbatên Şehîdan Mihyedîn Hesen, ji Rojnameya me re axvî.

**‘Şoreşa 19’ê Tîrmehê bi ked û xwîna şehîdan tacîdar bû’**

Hesen da zanîn ku destkeftiyên Şoreşa 19`ê Tîrmehê bi xwîna şehîdan hatiye pêkanîn û xwedîderketina malbatên wan erka me ye û wiha axaftina xwe domand:”Em di salvegera Şoreşa 19’ê Tîrmehê ya 11’an de ne. Herwiha vê şoreşê li Rêber Apo, malbatên şehîdan, şervanên azadiyê û li hemû gelên xwe yên pîroz dikin. Ev şoreş bi saya felsefeya Rêberê Apo û şehîdan destkeftiyên bi nirx hatin avakirin. Herwiha ji destpêka şoreşê heya roja îro me berdêlên giranbuha ji bo azadiyê dan û em hazirin hên jî bidin ji bona parastina van destkeftiyan û gihiştina jiyana azad û biromet. Berdêl jî şehîdên me ne, ew şehîdên ku ji bona azadiya gel û welat canê xwe feda kirin. Ji destpêka şoreşê û heyanî îro zêdeyî 12 hezar şehîd û cangorî canê xwe ji bona azadiyê fedakirine. Ji bona parastina şoreşê û destkeftiyan, wê têkoşîna me li dijî dagirkeriyê bê navber berdewam be. Me tevan soz daye ku li ser şopa şehîdên xwe heyanî azadiyê bimeşin. Di heman demê de em weke Meclisa Malbatên Şehîdan a bajarê Qamişlo, rewşa malbatên şehîdan dişopînin û ji hemû aliyan ve destekê didin wan. Ji ber ku xwedîderketina li malbatên şehîdan xwedîderkeina li şehîdan e û ev jî erkeke dikeve ser milê me tevan.”



**‘Meclisa Malbatên Şehîdan di xizmeta malbatên şehîdan de ye’**

Endamê Meclsa Malbatên Şehîdan, Mihyedîn Hesen diyar kir ku Meclisa Malbatên Şehîdan di xizmeta malbatên şehîdan de ye û wiha axaftina xwe bi dawî kir:”Me ji destpêka Şoreşa 19’ê Tîrmehê ve ev meclis damezrandiye û armanca meclisê jî destekdayîna malbatên şehîdan e. Li Qamişlo gelek komîteyên saziyê hene û rewşa malbatên şehîdan dişopîne. Herwiha di komînên bajêr de jî berdevkên saziyê hene. Ger pirsgirêk bi wan malbatan re çêbibe, komîte pirsgirêkê bi riya berdevkan parve dike û bi vî rengî tê çareserkirin. Ji milê kar û xebata ku tê kirin jî, ev komîte bi çalakiyên curbecur yên girêdayî şehîdan radibin, mîna kar û barê girêdayî merasîmê şehîdan. Ev kar û xebat tev ji bo malbatên cangoriyên azadiyê ye têne meşandin. Lehengên ku ji bo parastina me canê xwe feda kirin û gelek destkeftiyên binirx avakirin. Lehengên ku xwîna xwe di ber hebûna gel de rijandin. Ji ber vê yekê pêwîste ku Meclisa Malbatên Şehîdan û her kes xwedî li wan derkeve û şopa wan bigre.

# Divê dawî li tecrîdê bê anîn

**Hevserokê Partiya Herêman a Demokratîk (DBP) ê Wanê Harûn Okay got, tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li nava civakê dibe sedema rageşiyê û xwest, dawî li vê yekê bê anîn.**




Hevserokê Partiya Herêman a Demokratîk (DBP) ê Wanê Harûn Okay têkildarî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan axivî. Harûn Okay bi bîr xist ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan sala 1999’an bi komployeke navneteweyî anîn Tirkiyeyê, ji hingî ve 24 sal in tecrîdkirî ye, lê belê salên dawî tecrîd di nava tecrîdê de hatiye ferzkirin û şert û mercên ragirtinê bi rengekî nehiqûqî hatine girankirin.
Okay destnîşan kir ku astengkirina hevdîtina Abdullah Ocalan a bi malbat û parêzerên xwe re zerareke mezin dide aştiya civakî û got,”Hiqûqa navneteweyî û hiqûqa navxweyî tê binpêkirin. Rola Abdullah Ocalan a ji bo aştiyê tê zanîn. Di navbera salên 2013 û 2015’an de ku hingî çalak bû, kesekî bi tenê nehate kuştin. Ji sala 2015’an û pê ve tecrîd di nava tecrîdê de lê hate ferzkirin. Divê tecrîda li ser Abdullah Ocalan tavilê bê bidawîkirin. Eger ev yek pêk were wê dijberiya li nava civakê de hatiye afirandin bi dawî bibe.”

**‘Di mijara tecrîdê de bila gelê me hemû hişyar be’**

Okay diyar kir ku astengkirina hevdîtinên bi Rêberê Gelê Kurd re li derveyî hiqûqê ye û got, “Divê Abdullah Ocalan karibe ji mafên hemû hikumxwaran sûdê werbigire. Ji bo pêkhatina aştiya civakî, em bang li gelên Tirkiyeyê hemûyan dikin ku di mijara rakirina tecrîdê de hişyar bin.”




## Civakek nû tenê bi çandek nû gengaz e



**Zekî Bedran**

Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin dorpêçek mezin de ye. Taybet dewleta Tirk hebûna demokratîk a li vir, hebûna Kurdan ji bo xwe weke xeteriyek mezin û dijminiyekî dibîne. Li gel ku hinek herêm dagir kiriye û nîjada Kurd tune dike jî dijminahiya wî kêm nabe. Berovajî dagirkirina Sûriyê wî bi cesarettir dike û bê navber êriş dike. Ji bo planên nû yên dagirkeriyê di lêgerînan de ye, tifaqan çêdike û dikeve bazarê. Hikumeta Şamê jî hem demokrasiyê, hem jî xweseriya ku Kurd bi nasnameya xwe tê de dijîn ji xwe re weke dijmin dibîne. Li gor wan jî teqez divê herêm rêveberiya xweser were desteserkirin û rêveberiyên heyî ji holê bên rakirin. Îran û Rûsya hikumeta Şamê destek dikin. Hewl didin li ser lingan bihêlin. Tirkiye, Îran, Sûriye û Rûsya di mijara derketina DYE û hêzên koalîsyonê ji Sûriyê di hevdîtinên Astanayê de bûn yek. Eger DYE ji herêmê derbikeve dê Kurd û rêveberiya xweser xwe li ser lingan negire û ji êrişan re destdayî be. Ji derveyî wê, eger herêmên petrolê û derfetên aborî ji destê wan derbikevin nikarin xwe bidebirînin û belav bibin. Ev hêz hesabên wiha dikin. Dê xizmet rawestin û eger gel ji derfetên aborî bê par bimîne dê rêveberiya xweser tesfiye bibe. Ji derveyî wê dê mirov bê kar û birçî bimînin. Di heman demê de dema jiyana wan bikeve xeteriyê dê axa xwe biterikînin. Ev hêz wiha difikirin. JÎ ber wê jî hertim êriş, sîwqastên bejahî û hewayî her diçe zêde dibin. Ji bo bêîstiqrariya herêmê û kûrbûna aloziyê bi şêweyekî li hev dikin. DYE û welatên NATO’yê li dijî êrişên dewleta Tirk ranewestiyan û xwedî li rêveberiya xweser derneketin û piştgirî nedan ê. Di vê mijarê de gelek analîz û nêrîn hatin weşandin, tê nîqaşkirin. Pêwîst nake em bikevin hûrguliyên wê. Em nikarin bêjin ev dorpêç û êriş bê bandor in. Taybet di demên dawî de derketina ji welat zêde bûye. Hîn zêdetir ciwan derdikevin.
Li hemberî vê dorpêç û êrişan rêya herî bibandor û mayînde xwe birêxistinkirina gel e. Bi lihêvîmayîna hêzên derve nikarin bigihin tu deran. Gelê herêmê ev dît û jiya. Serguzeşt û têgihiştinek diyar jî çêbû. Lê hîn jî di rêxistinbûnê de pirsgirêk û kêmahî hene. Taybet perwerdekirin û rêxistinbûna gel neçare bibe mijara sereke. Akademiyên demokrasiyê hene ku ev bi salane perwerdeyê didin. Bi hezaran mirov di van akademiyan de perwerde dîtin. Lê encamên wê qasî tê xwestin nateyîsin pratîkê. Eger civakek demokratîk bê avakirin, divê gel di vî alî de bê perwerdekirin û rêxistinkirin. Tenê bi vê perwerde û rêxistinê komîn û meclîs dikarin bên aktîfkirin û gel fêrî xwe birêvebirinê bibe.
Armanca rêveberiya xweser ne rêxistinek bi terzê dewletê ye. Armanc pergalek demokratîk e ku civak di navendê de be. Ev jî tenê dikare bi pergala komîn û meclîsan pêk were. Di vî alî de erkê rêveberiya xweser ew e ku bi sazî û xebatên xwe civaka rêxistinkirî ava bike. Eger rêveberî kesayetek bîrokratîk qezenç bikin û ji gel qut bibin dê tesfiye bibin. Rêveberiya xweser hêza xwe ji gel digre. Eger civak rêxistinkirî be, dikare xwe biparêze, bi hêza hilberînê aboriya xwe rêxistin bike. Civakek rêxistinkirî û têgihiştî pişta xwe dide hêza xwe ya cewherî û dikare tevahî pêwîstiyên xwe peyda bike.
Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê niha serweriya hikumetek navendî tune ye. Gel xwe diparêze û rêxistin dike. Tevahî ol, nasnameyên cuda û çand dikarin di nava aştiyê de bi hev re bijîn. Tama jiyana hevpar girtine. Ne di wê lêgerînê de ne ku bibin serwerên hev. Ev pir girîng e û rewşek nû ye. Ev rewş bi serê xwe şoreşekî îfade dike. Li herêmek weke Rojhilata Navîn jin di civakê de bi bandor in û rolek pêşeng dilîzin, ev lingê herî bihêz ê şoreşê ye. Lê weke me diyar kirî ev şoreş û destkeftî neketine bin mîsogeriyê. Di hedefê de ye û dixwazin ji holê rakin. Ji be wê jî pêwîste di demokrasiyê de bi israr bin û ji bo vê çandê bikin malê gel bê navber bixebitin. Tevahî meclîs, ronakbîr û yên di rêveberiya xweser de cih digirin, pêwîste bê rawestan û bê ku xwe li pişt hinceta veşêrin, ji bo avakirina çandek demokratîk lezê bidin xebatên xwe. Divê kes li benda kesî nemîne. Herkes û her sazî, kesên ji xwe re dibêjin em pêşengin, bi ruhek seferberiyê bi erkê rêxistinkirin û perwerdekirina civakê re rû bi rû ne. Heta ku çandek nû neyê avakirin, şoreş û destkefiyên wê nakevin bin mîsogeriyê. Dê tevahî ked û berdêlên hatine dayîn berhewa bin.